ihres Hingabevermögens.
Ihr grösster Reichtum
waren aber
- wie überall auf der Welt
bei den Armen -
die vielen, lachenden Kinder.

Noch klingt mir

die Musik im Ohr,
noch höre ich,
wie Şükrü nach dem Tanz
beim gemeinsamen Essen
- Männer und Männer,
Frauen und Frauen
sassen zusammen -
stolz sagte :

Siehst du,
das ist die Art,
das sind die Lieder und Tänze
meiner Leute.
Die Sprache,
die du vernimmst,
ist die Sprache der Kurden,
die Sprache von Mam und Zin.²⁾

Viele von uns
leben in Armut,
Unrecht, viel Unrecht
ist unserem im viergeteilten
Kurdistan lebenden Volk
geschehen und geschieht ihm
noch immer.
Doch wir wissen :
Der tollwütige Hund
lebt nur vierzig Tage.³⁾

Vielleicht wird wahr,
dass das Wort
über sieben Berge hinweg
denjenigen erreicht,
den es betrifft,⁴⁾
wie ein Kurdisches Sprichwort
sagt.
Darum schicke ich mein Gedicht,
schicke ich dieses Wort
nach Diyarbakir :

Kurdistan lebt,
so lange in Kurdischer Zunge
gesprochen,
von Kurdischer Geschichte

berichtet wird,
so lange Kurden ihre Lieder singen
und ihre Tänze tanzen,
ihre Sitten und Bräuche bewahren.

Möge es den Unterdrückten
gelingen,
ihren Kampf so zu führen,
dass das Recht
auf ihrer Seite bleibt,
dass ihre gerechte Sache
durch Unrecht
keinen Schaden nimmt.

Ich träume von einer Welt,
in der kein Volk
ein anderes mehr herabsetzt,
um sich zu erhöhen,
in der es keine Unterdrücker
und Unterdrückten mehr gibt,
und die heute noch unversöhnten
Völker
brüderlich zusammenleben.

Damit aber diese Welt
möglich wird,
muss jedes Volk selbstbestimmt
leben,
darf es in keinem Volk
Herren und Knechte mehr geben,
muss der Mensch
sich zum Menschen
emanzipiert haben.

Hans-Herbert Dreiske
Oktober 1987 - Düsseldorf

Anmerkungen:

1), 3) und 4) Kurdische Sprichwörter, zitiert nach
Jemal Nebez "Sprichwörter und
Redensarten aus Kurdistan" München, 1970

2) Mam und Zin = Romeo und Julia der Kurden

HELBESTWANÊ ELMAN H - H - D

Hans-Herbert Dreiske, roja 24.3.1943 li bajara Bremenê hate dinê. Li nav gelik beşên karda xebitî. Xebatê civakî û ilmê civakî li bajarê Bochumê xwand û niha Düsseldorfê dijît.

Hans Herbert Dreiske ser 10 pirtoken Helbestan weşan kirîye û gelik rojname û kowaranda helbestên wî derketîne. Helbestwan endame "Peşenga Nu a Surrealismus, Desire + Hember -realismus" eye.

AMEDA REŞ

Ev bû demeke dirêj e
ligel xwe digerinim,
wê helbesta xwe ya nenivisî,
ya ku hêrgiz dixwaze were nivisîn
û wek nameyekê were şandin.
Jiber vê yekê dixwazim îro
wê birêjim ser pelikan
û bişînim
ji hevalên Diyarbekirê re.

Wek niha berçav e
ev bajar
yê ku berê bi navê Amed,
paşê bi navê Kara Amid,
Ameda Reş hate binavkirin.
Ew bajarê bi reşkevîran surkirî
û bi girtigehek tirsdar.

Li wir û li saxa Diclê
tête bayekî taybetî,
û di nav merovan de
hêj tête naskirin:

"Mêvan cejna
mazûban e".1)

Birina Meyîtekî,
Mîna ji filmêka
Yılmaz Güney,
dikişiya wek şemakê
di nav kolanan re,
di ber Mizgefta Mezin re
û Karwansarayên kevn re.
Mêrên berketî û bejinzirav
- bi dor-
dikişandin ew meyîtê pêçandî.

Li derveyî suran
min xwe digirt li dengê
bilûr û defan.
Nişkave min xwe dît
di nav şadimaniyekê de.
Li ser banên pehn
yên xaniyan
jinan bala xwe didan
govenda mêran.
Berê biriqî
bi tîrijên rojê
ew tasa nû

ku pê ava sar dagirtî
pêşkeşi min kirin.

Raste-rast, lê xem
merovan bala xwe berdidan
ser rûyê min.

Bê vekişin
bala xwe didan min gişan,
taw nedan min
bikaribim bîstekê
xwe bibînim biyanî.

Neçaran
malên xwe bi min dinimandin,
dewlemendiya
hîsên xwe yên xwezayî,
şabûna xwa û
hevalbendiya xwe.

Mezintirîn dewlemendiya wan
-wek li her derê cihanê, li ba ^{neçaran-}
gellek zarokên rûken bûn.

Hêj dengê mûzîkê
di guhê min de ye,
Hêj ez dibihîsim
çawa Şükrü piştî govêndê
li ser xarinê
- Mêr û mêr,
jin û jin
tev rûniştîbûn-
bi serbilindî got:
tu dibînî,
ev e tun,

ev in stran û govêndên
gelê min.

Zimanê
ku tu dibihîzî,
zimanê Kurdan e,
zimanê ji Mem û Zîn e. 2)

Gellek ji me dijîn di neçariyê de,
bêmafî, bêmafîyên dijwar
di Kurdistana me ya çarpirçekirî d
li gelê me bû û li wî
hêj jî dibe.
Lê em çak dizanin:
"Segê har
dikare çel rojan bijî".3)

Dibe ku bibe rast,
ku ew gotina li ser heft çiyar re
bigêhe wan kesan ^{derbas bibe}
yên ku bona wan hate gotin,
wek metheloka kurdi
dibêje.
Jiber vê yekê ez helbesta xwe,
vê gotinê
dişînim Diyarbekirê:
Kurdistan dê her bijî,
ta ku zimanê kurdi
were peyivîn,
li ser dîroka Kurd
were axaftin
ta ku Kurd stranên xwe bistirên

û govendên xwe bikşînin,
Rabûn-rûniştin û adetên xwe
biparêzin.
Hêvidar im ku yên bindest
bikaribin,
têkoşîna xwe wisa bajon,
ku mafdarî
li aliyê wan bimîne,
ku pirsîyara wan ya mafdar
bi bêmafiyan
nebe birîndar.
Ez di xevna xwe de cîhanekê
dibînim
ku tê de gelek
êdî gelekî binling neke,

ji bo xwe bilind bike,
ku tê de êdî kesên zordest
û jar nemînin,
û ew gelên ku îro lihevnehatine
bi biratî tev bijîn.
Da ku bikaribe cîhanekê welê
bibe ava,
divê her gel li ser biryara xwe
bijî,
Divê di nav gelan de
ne axa û ne jî xulam hebin,
divê merov her ji bo merovbûna
xwe rizgar bibe.

Bi drêjîya salan, hê berî Yeketiya Sovyêt were holê, qeyserên Rûs hewl did an, ku Kurdan li dij Emperatoriya Osmanliyan û dewleta Faris bo xwe têxine kar, lê ne ji daxwaza wan bû ku Kurd bi xwe bibine xwedan dewlet.

Dû damezirandina Yeketiya Sovyêt karbidestên Mosko hewl dan, ku nehêlin hebûna Kurdan bi carekê de ji holê rabe, lê wan jî wek qeyserên Rûs pişt nedana damezirandina Kurdistaneke serbixwe. Li bervacaya wê, wan hîştin Komara Mehabadê were hilweşandin. Li milê din, di hindir Yeketiya Sovyêt bi xwe de, di dema Stalîn de, hejmareke Kurdên Sovyêt bi hukmê zorê ji gundên xwe hatin derxistin û li şûnên ji Kurdistanê dûr hatin bi cîh kirin.

Sedem ew bû, ku Ermeniyên û karbidestên Sovyêt nedixwaztin hejmara Kurdan li şûnekê mafê hebûna komareke Kurd, yan xudmuxtariyeke di hindir Ermenistanê de rojekê bide wan.

Çiqa partiyên Kurdan bi xwe jî hewl dan vê yekê ji gelê Kurd veşêrin, niştimanperwerên Kurd yên li şûnên cuda li hindir Yekekiya Sovyêt ev kirina ji xwe bîr ranekirine û îroj jî, ger fersend hebe, dibêjin. Ger Yeketiya Sovyêt rola xwe ya oportunist di derheqê pirsê Kurdî de nelîztibûya, ne rewşa têkoşîna Kurdan ê ev rewşa li holê bûya, ne jî karbidestên wek yên Bexda ê îroj biwêribûna bêtareke wisa wînin serê Kurdan. Ji ber ku îroj mîzîna hêza siyasî ne li dij mesleheta (berjewendîya) Yeketiya Sovyêt e li Rohilata Navîn, hewceya wan bi Kurdan tune, lê tevî her tiştî jî hindê Kurd hê nuha jî Yeketiya Sovyêt wek dostekî gelê Kurd dizanin.

Rastî ew e, ku dostên Kurdan tunen. Yeketiya Sovyêt ta îroj rê nade ku partiyekî Komonîstî Kurdistanî hebe. Bi rastî ne daxwaza min bû, ku ez car din behsa Yeketiya Sovyêt bikim, lê min bi kurtî ew yeka ber bi çav hanî bo werim ser Emerîka Yekbûyî. Ev bûn dora du salan, ku Emerîka Yekbûyî dest pêkirîye bi hin şeweyên nîvçe pişt Kurdan bigre. Emerîka ji Tirkî hêvî dikêye, ku hebûna Kurdan bipejirîne û mafên wan yên çandî bide. Dû bikarhanîna çekên kîmawî li dij Kurdan, bi taybetî dî ku bêtir ji sed hezar Kurd ji başûrê Kurdistanê reviyên, Emerîka cardin piştgiirtineke nîvçe kir. Ji ber ku ew piştgiirtina, çiqa nîvçe be jî, ji piştgiirtina welatên cîhanê yên din bêtir bû, hejmareke Kurdan, yan xwe bi ev piştgiirtina nîvçe dixapînin, yan pê tîyên xapandin.

Çawa Yeketiya Sovyêt hêvî dike, ku Kurd bi carekê de ji holê ranebin, lê di eynî demê de nebin xwedan dewlet,

herweha Emerîka jî. Ji ber ku re ku rêxistinên Kurdan bê qeyd û şert her dem potînên Yeketiya Sovyêt paqîş dikirin, Emerîka Yekbûyî ta demeke nêzik ji Kurdan ne razî bû. Piştgirtina Emerîka ya nîvçe bo Kurdan îroj bo amancane, ku li dûr digihên hev. Bo Emerîka Yekbûyî, endamên NATO û Ciyaka Ewropî pejirandina Tirkiyê wek hevalekî, bêyî ku ew hebûna Kurdan bipejirîne û bi kêmasî li ser kaxezê çend mafên çandî bide wan, rûreşîyeke mezin e. Bi daxwaza Emerîka û welatên Ewropa ye, ku îroj li Tirkiyê bi hawakî vekirî behsa hebûna Kurdan û mafên wan dibêje. Amanca dûr bo Emerîka û Ewropa ew e, ku Kurd bo rojên li pêş werin parastin; kesek nizane sibe li Rohilata Navîn çi dibe; belkî Kurd bo wan lazim bibin.

Li milê din, derketina Emerîka li dij bikarhanîna çekên kîmawî û derketina Kurdan ji başûrê Kurdistanê ji karbidestên Waşinton bi xwe nehatiye der. Bêtir ji mala senatoran hatiye der. Haya hukmata Emerîka ji mêj ve jê heye, ku Îraq çekên kîmawî bi kar tîne. Wekî di weşanên giştî de diyar bû, li nik Emerîka kasê hene, ku têda dengê pîlot û qumandarên Îraqê askere dikin, ku wan çekên kîmawî li Kurdistanê bi kar hanîne. Lê wek kovara TIME dibêje, bi alîkariya Emerîka bû, ku Îraq li dij Îranê ta nuha li ser lingan ma. Emerîka naxwaze Kurd qirr bibin, lê herweha naxwaze Îraqê û Ereban jî weqa bixeyidîne.

Me got piştgirtin bêtir ji mala senatoran hat. Kî bûn ew senator û bo çi? Ber bersîva vê pirsê were dayîn divêt xuya bikim, ku sedem çi dibe jî, ew piştgirtina ne tiştêkî xirab bû, û bi xêra wê piştgirtinê bû, ku rojname û radyo û têlvîzyonên cîhanê weqa li ser Kurdan nivîsandin û gotin. Amanca min tenê ew e, ku merov bizanibe, ku îroj ne dostî, lê tenê meslehet heye.

Serokwezîrê Israîl vekirî got, ku rawestandina şerê Îran û Îraqê bo rihetî û hebûna Israîl tehlûkeye mezin e. Bo Berdewamkirina Israîl hebûna Kurdan wek neteweyeke bîndestê du welatên Ereba tiştêkî bi sûd e. Loma rêxistin û kesên zîyonîst û senatorên pişt Israîl digirin, ta jî dest wan were, nahêlin Kurd li Îraqê qirr bibin, lê herweha ew jî ne amade ne piştgirtîyeke bi tevahî bidin têkoşîna Kurdan. Ger Kurd mafên xwe bi tevahî bigirin, heye ku sibe, yan du sibe dostanî di navbera wan û welatên Rohilata Navîn yê din de hebe, lê gor Kurd bêmaf, yan xwedan nîmaf bin, fersendê tum hebe, ku welatek wan bo amancên xwe dîvre bi kar wîne. Wisa amanca Emerîka Yekbûyî ne alîkariya Kurdan bû, lê rawestandina berdewamkirina

qirrkirina wan bû, loma ne li Îraqê, ne jî li Tirkiyê zor hat kirin, ku ew bihêlin pisporên navnetewî biçin Kurdistanê bo bikarhanîna çekên kîmawî îspat bikin. Wek rojnameya The Australian dibêje, dû mehekê îspatkirina bi karhanîna çekên wisa êdi ne pêkan e. Hin ji wan dû rojekê şopên xwe wenda dikin.

Xapandin êdî bes e. Bila kesek wer texmîn neke, ku dostên Kurd li Emerîka yê xebatê bi serê xwe dikine. Dost û dijminên Kurdan ber her kesî ew bi xwe ne. Hindek Kurd dibêjin, divêt em li benda fersendên dîrokî bin. Fersendên dîrokî îroj jî hene, lê enîyeke Kurdane netewî, ku bikaribe van fersendan bo xwe bi kar wîne û mesleheta yê din bo xwe bike meslehet, mixabin li holê tune. Loma, piştgirtina nîvçe û bo sûda yê din, ta enîyeke Kurdistanî, yan bi kêmasî partîyekî xwedan hêz û zanistî neyê holê sûdeke wega mezin li netewa Kurd nake.

ŞÊX EZEDDÎN HUSÊNÎ

Şêx Ezeddîn Husênî (di hevpeyvîneke bi Ş.B.Sorekli re :
9.6.1988)

*Diyare, gelî Kurd li seretayî îslam da, ku îslam hatiwa, şerekî zor gewre kirdiwe. Lê paşan, wextê ku bûye îslam û teslîm bûye zor baş îslam qebûl kirdiwe. We di drêjî tarîx da milletî Kurd wek milletekî musulman hemîşe neqşî bûwe li xizmetî îslam da hem li nahiyeyî mubareze kirdin li ew kesanî ziddî îslam, hem li nahiyeyî ilm, û ûlenayî zor gewreyî, wek Îbnûsela, wek Îbnû Teymiye, wek peyayê zor gewre, ku xizmet bo îslam kirdiwa, wek Şarezûriyekan ûhd. Ta ev roj Kurd beşek e ji camiyî îslamî, û eger bête gotin, ew ji hemî milletekanî mentiqê musulmantir e û usûlî îslam baştir hifiz kirdiwe, renge dûr nebî (mat memîn), çunkî alûdegî li nêv Kurdistan da zor kêr e û xurafatî mezhebî, wek di nêv Şî-e de ye, ya li nêv Turkanî Osmanî da heye, li Kurdistan niye. Kurd îslamî rastî qebûl kirdiwe û xizmet jî bo kirdiwe. Mesela, Selaheddîn gewretiriyên xizmet bo alemî îslam kirdiwa, ku bi ittîfaq Kurd bû. Ema illet ew e, ku Kurd bo esasen îstifade nekirdiwe, ku bi navî xoy dewletek bo wî hebe, herwekî milletanî din. Tirk hatiwe gewretirên behrey wergirtiwe, Îraniyekan herweha, hemû pêkhatûn hikûmetiyan dirust kirdiwe, emma Kurd, bo? Kurd eslen ji tarîxî zor drêj da wek milletekî nehatûte kayewe, yanê xo bi milletek bizanê, cuda li Faris, cuda li Tirk we Ereb, bi ew şêwe, wek millet xebatî xoy neniwandiwe. Îranî hatin hikûmet bi navî Îslam dirust kirdiwe. Meselen, Qacareyekan, Sefewiyekan, emma esasen navî Îslam bo wan metreh nebûwe; weke nuha jî dibîni, dewlete erebiyekan, yan xumênî, ya wane ku bi navî Îslam kardikin, lê Îslam û hedefî Îslam li wan da mewcûd niye (amancên Îslam li cem wan tune), ku ewana azadiyê û hiqûqî xelq bidin. Ya li ber ewe ye, ta wextek Îslam bo ewe bû, ku xelk lêyî behrewer bigrê û hukmatî xo pê dirûst bikat, her wekî ku Erebek, Tirkek, Farisekan bi navî Îslam hikûmetiyan dirust kirdiwe. Wê wextê Kurd xwe wek milletekî nenasiye. Wextek hatiy ku xuya bûye, eslen ew hukmatana hêçyan Îslamî nebûn. Xulase ew e, ku Kurd ta wextekî bo li Îslam behreberdarî biket û bi nêvî xo hikûmet dirust biket, xoy wek millet bi hesêb nehênawa (dema Kurdan dikaribûn ji Îslam sûdê bibînin û dewleteke bi navê xwe çêkin, wan xwe wek milletekî nehesibandine). Wextek jî hatiye xo wek millet bihesibîne, ew hikûmetegewraney ku li dewr û ber bûn, zahiran musulman bûn, lê heç ehd û peymanekî Îslamî

we însaniyan nebûwe, herxerîkî xwardinî milletî Kurd bûn.

*Hêzên siyasî îdyolojiyên wan hene; meselen li Kurdistanî Iran Hizbî Dêmkokrat dibê: dêmkratî bo Iran û xudmuxtari (otonomî) bo Kurdistan. Komele, Hizbî Komonîstî Iran, meseley tebeqatî zil dikatewa we meseley millî eslen tezîf diket (Komele, ya ku navê partî Komonîstî Iran li xwe kiriye, pirsra çînî kiriye amanc û pirsra netewî li paş hîştiye). Hizbî Dêmkokrat meseley millî bi destew girtiwe we meseley tebeqatî (çînî) wanîk diket we bi heqîqet mesele ew e, ku şeweyekî xwedîtin û xurûr û xo mihwerbûnî ye, ew e ku her kes dixwaze hertişt di bin dest wî de be. Li Kurdistanî Iran hindêk hizib û sazmanek heye eslen çawî ewey nabîne ku kesekin tiştêk bi xilafî ewey bibêje. Bimin wa ye, eger nabesaman-iyek li Kurdistan heye hemû ji wan e, lê belê gelî Kurd wek millet, hemû terefdarî eweye ku mubarezeyekî wahid (têkoşîneke hevgiştî) bêt û li yek sef de bereleyî xumeynî bin û hemû bo rizgarî milletî Kurd mubareze bikin. Ew ixtilafî ku êsta heye, hemû sazmanî (rêxistinên) siyasîyekan dirust dikin, ne ku milleteke; illet jî ew e, ku bi rastî ew sazmanana (rêxistinên siyasî) dûr in ji waqî-iî camîey Kurd-istan, ewey dihêlin, ewey dikin li gel camîey Kurdistan rêk nakewê.

Beşbeşbûnî milletî Kurd tasîrekî zor heye ku Kurdistanîyekan yeknagrînewe.

*Berê, li zemanî Şex Obêdella we lizemanî mîrekanda hêçwex-tekî meseley xudmuxtari (otonomî) metreh nebûwe. Min nameyek dî, ku xelkî Sablax, cemaetekî zemanî Şêx Obeydulla nuwîsbûn bo Tzarî Rûs, ku em dixwazin musteqil (serbixwe) bin, şikayet-iyên li dewletî Iran bû. Ji Tzarî Rûs xweztibûn ku alîkariya wan bike bo sexwebûn. Ew mesele her li dewranî şêxekan da, lî dewranî mîrekan da hemî wek millet, wek rizgarî qiset lê kirawa. We eslen qise ne ew bû Kurdistanî koy rizgar bibe, yan Kurdistanî koy rizgar nebe, kar bo hemû Kurdan dikirin, hema bidaxewa (mixabin) di ew çel-pênçe salên dawîn da ew kelîmey ne muqeddes hanîne ser zimanî milletî Kurd û li hemû şûn teblîx boy kira: xudmuxtari! Bi eqlî min, divêt her tişt were kirin, bo ew kelîmey xudmuxtari di qamûsî siyasî (ferheng) milletî Kurd de bikujêt û nabê bibêt (ev bêjeya 'otonomî' divêt ji ferhenga siyasî ya gelê Kurd rabe û neyê bikarhanîn). Zor li me zirar kirdiwa; xudmuxtari tiştêk niye, bidrê, yan bis-tindrê, ne dindrê, ne distinrê (otonomî tiştêkî hel nake), çunku eger dewletek bibêt belê, tu bi zimanî xwe bixwêne, îdaratî mihellî bi dest xo bê, hemû tiştêkî bidê te, emma (lê belê) çunkî îqtîsadeke (okonomî/aborî) li ber destî

dewletî merkezî ye, erteşeke (hêzên leşkerî) li ber destî dewletî merkezî ye, her wextê dewletî merketî ger bixwaze, dikare her tiştî ji dest te bigre. Li zor cîhke xudmuxtariî heye. A nuha li Kurdistanî Îraq, ew e xudmuxtariye, ka bo çi gelî Kurd razî niye û her dawa diket? Ewa niye gelî Kurd li Îran ji çel sal zêdetir e bo xudmuxtariî xebat dike û hêç bi tişteki negîştiwe?

Me weqa şêhîd dane, eger bo istiqlal (serxwebûn) dabaya, eger bo azadîman dabaya, em nuha azad bû bûn. Ewcar xelq jî li serit naketewa; Eger tu li nuçteyekî Kurdistan dawî istiqlal bikît we alay azadî û serbixoy helgirî, heddî eçel (bi Kêmasî) bîst dewlet heye belkî ku pişt te bigre, belam çunkî mesele meselekî daxilî (hindir) ye, kes xo li ser piya û xerab naket. Min li mêj e, pênc-şeş sal e, ku gîştîme ew qenaet, xudmuxtariî ne tişteke e. Ya dibê milletî Kurd xebat neket, danîşê li malî xoy we teslîm bê, yan eger xebat diket bo rizgarî biket. üzrî ê wan ew e, ku xwaztina veqetê dibe sedem, ku ew me hemûyan dikujin. Ma ew vî tiştî êsta nakin? Gund û bajar wêran nekirine? Xelk ne kujrawe, xelk derbeder nekirawe??? Eger bo istiqlal bûya ew her ew bi me dihat. Hema bi kêmasî li mesrehî cîhan da ê xuya ba Kurd wek milletekî xebat dikin, lê a nuha Kurd wek milletek xebat naket, wek beşek li Îran xebat diket, wek beşek li Îraq xebat diket. Kurd wextek detwanî (dikare) heqî xoy wergirê, ku wek milletek bête saheyê û bibê, min milletekî bîst milyon im, millet im millet, serzemînî xom heye, zimanî xom heye, iqtîsadî xom heye, ferhengî xasî xom heye; wek milletek zulm li min tê kirin; û ewana ku Kurdistan di bin destan da ye bi dagirkeran bizane, ne bra. Eger bra ye çima heqî nadê te?! Eger bra ye bo te dikujê? Na wella, dagirker e, îşxalker e û hêç ferqî wî niye ji îşxalkerekî din Nahêle bi zimanî xo tu qise bikî, bi zimanî xo tu bixwênî!

Bi bî û bawerî min, mixabin, sazmanên (rêxistinên) siyasiyekanî Kurdistanî Îran, wek hizbî dêmokrat we Komele, farisekan bi xwe jî İranî ninin wekî ku ew İranî ne, ne wekî Qasimlo, ya ewê din İranî ne. Eger millet î, eger waqien (rast) xwe millet dizanî, wek millet dawa bike, yan na, çima hev dikujin. (Eger wek millet xebat bikî) ya te dikujin, asûde dibî, ya heqî xoy digrî û ser dikewî.

* Kurdistanî Îran li zerfî ew heşt, noh, deh salan de xebat ku dest pêkirdiwe, duwayî (li dû) rowîştinî Şah û hatinî rejîmî Xumeynî xebatekî zor fireh û gewre li Kurdistanî Îran dirust bûwe. Ewelen (yekem), li heysî siyasiweye (ji halî

siyasî de) pêşkewtinî fikrê xelqê, gelî Kurd, zor, zor
 pêşkewtiwe. Emin bi şehamet delêm (bi serbilindî dibêjim),
 Kurdli zerfî ew heşt-noh salî de bi qed (qasî) pênçe salî
 pêş xoy pêşreftî fikrî we endîşe we rewştî eqlî peyda
 kirdiwe, elletekeş ewe ye, pênc-şeş salan Kurdistanî İran
 duwayî hatinî Xumeynî azad bû, belam ehzabî siyasî yek
 hizib nebû, da yek rê bo xelk nêşan bidin û bixête yek
 kenalewe. Efkari cûracûr bû, ... Eger efkarî cudacuda bû,
 hemû tiştan teblîx wan kird, xelk hişartir dibe, bo xoy
 fikrî ku şad dibê û li heysî teslîmnebûnî li muqabilî
 dewlet da, teslîmnebûnî siyasî, her ew bîrûbawerî azadî
 ye, ku nehîştiye rejîmî Xumeynî li Kurdistan payegay bibe
 (bi ser neketiye), yanê cêpêyekî niye ku bibêtewe, li gel
 ew jî rawawe; erê musellet kiriye ta hidûdek, ema nikari-
 bûye tesxîrî fikrî xelq biket. Ji hêla çekdarî da mubarezekî
 zor gewre li gel rejîm kirdiwe, beynekî (demekê) şerekî
 cebhewî bû, ne partîzanî. Çar-pênc sal dewlet herku yek dibû
 pêşmerge lêy dida û pîrraniya şûnan di destî pêşmerge de bû.
 Paşen ku dewlet musellet bû, cegî partîzanî dest pê kir; dîsa
 jî pêşmerge dikete kûranî Kurdistan, ta diçe Sablax, ta diçe
 Sene meselen. Xelk êşarêtewe, nan didinê. Diçin şûnên ku
 paygaw dewlet lê heye, xelk wan di malan da vedişêre.
 Ew fidakarî ku Kurd kiriye li Kurdistanî İran bi rastî ji
 Vêtnam, ji Cezayir û ji her nuqtayekî dunya ne kêmtir e.
 Meeziretek (kêmasiyek) hebe ew ya hêzesiyasekan e, ku nizanin
 çon xwe li xelk wînin. Xelk zemîne amade ye.
 Min li ser ta serî Kurdistan da, li Kurdistanî Tirkeya, li
 Kurdistanî Iraq emin şores bi zindû dizanim, millet, millet,
 min millet delêm (ez li ser millet dibêjime), qise bi sazman
 nakim (gotina min ne li ser rêxistinane), millet nuha ji hemû
 wextên din amadetir e, çunkî derkî xoy kirdiwe (di xwe der-
 xistiye, xwe nas kiriye). Muşkiley (gels, problêm) gelî Kurd
 ew bû, ku nedizanî ew millet e û heye û heqî divê (xwedan
 maf e), de na, li mêj bû milletî Kurd istiqlalî ebû (ger na
 wisa bûya ji mêj gelê Kurd rizgar bû bû). Hema êsta (lê nuha),
 milletî Kurd dizane ew millet e û zulm lê dibe û dagir egrê
 (mêtîngêh bûye). Gotin ew e, ku xudmuxtari pê hêç niye,
 êşarey ruşd e (otonomî li xweşiya gelê Kurd nayê û xwaztina
 otonomiyê nêşana neçariyê-zelîfbûnê- ye).
 Min pêş deh sal wer dizanî xudmuxtari hemû tişte, belam
 êsta (lê nuha) tê gihîştin ku hêç niye. Li Kurdistan yek
 muškile heye, yek muškiley ku bi eqîdey min (bi baweriya min)
 her grîng e û esasî ye: rêyek ku Kurd pêda biron bo hedefekî
 (riyake ku gelê Kurd tê de bo amancekê pêşve here), kesekî

xelk nexistiye ser ew rê ye. Ger Kurd millete, rizgarî pê divêt, divêt wek millet xebat biket; divêt hizbek, yan sazmanek hebê, hedefî rizgarbûnî Kurd be.

Hema bidaxewa (lê belê mixabin) hindek kes hene, dixwazine tewawî cîhan rizgar bikin, karkerî cîhanê hemû rizgar bikin, emcar Kurd jî rizgar dibêt! Kuro kaka, Kurd millet e, wek millet zulm lê dibe.

Tenzîmî KOMELE sazmanekî rêk û pêk û munezem bû, yanî sazmanî Inqilabî Zehmetkêşanî Kurdistanî Iran bû, gellek kurên baş di ew sazman de bû, ema bi daxewa KOMELE kirin Hizbî Komonîstî Iran. Ew zerbeyek bû li Komele û li xebatî gelê Kurd. Hizbî Komonîstî Iran eslen netwanê (nikare) li Iran ruşd bikat. Milletî Kurd wek milletekî rizgar niye. Çawa diyar e, min nefyî mubarezeyî tebeqatî (çînî) nakim. Neffî ew nakim (înkar nakim), eger Kurd rizgar bibe, hêja ye hukmatekî bi nefelî (bo sûdê) karker û zehmetkêş û cotyar û feqîr hebe. Emma (lê) meseley eslî ew e ku Kurd wek millet rizgar bibe. Erê, karkerî Îsfehan zulm lê dibêt, karkerî Kurdistan jî zulm lê dibêt, lê belê di navberî herdu zulm de fêrî heye, ewa (karkerî Îsfehan) ferhengî xoy heye, dixwaze dewletê bo menfetî xo biguhere, yê me hêç tiştêkî me niye, divêt dirust bibin. (Loma) Ew duwana natwanin (nikarin) yek kar bikin. Ca min pê wa ye, Komele tundrewî kirdiwe, yanê wa pêşkewtiwe li gel, tev xelkê nehatiye. Hizbî Dêموکرات, rast e daway meseley millî û mafî xudmuxtari diket, hema (lê) Hizbî Dêموکرات hemîşt dumbale reyî xelk e, hizbekî pêşrew niye, sazmanekî rêk û pêk niye. Bi manekî din (yanê), Hizbî Dêموکرات li dûwayî xelkê diherêye (li paş gel maye), Komele jî zor pêş xelk kewtiwe we li xelk dîr kewtiwe. Bi eqlî min, gewretirîn rexne ye li dunyayê em ro hukmî zatî metreh bikî (bi dîtina min, mezintiriyên şastiyê ew e, ku yek îroj daxwaza otonomî bike). Ez nabêjim ku herdu (Partî Dêموکرات û Komele) mubareze nakin. Pêşmergeên wan jî hene, xebat jî kirdine, zerbeyî zor gewre jî li dewlet didin. Pêşmergey Komele, wek kurekî ciwanî exlaqçakî muxlis, wacib bo wî ew e, ku Kurd rizgar bike; ne bibêje, hemû karkerî Iran û dunya rizgar bibin, paşen jî Kurd rizgar dibê.

* Di xelk da zemîne û hazirî heye ku xebatê bike. Lê du muşkil li pêş me hene. Yekem, rêxistinên me yê siyasî, her yek bo xo xetek diyarî kirdiwe, hem Komele, hem Dêموکرات, hem ew û hem ew.

Duwan, Kurd beşbeş e, ew beşbeşbûna mesele (yekitî û hevgerîtin) bi rêk dîr xistitewe. Ihtiyac bi rewşenbîranî Kurde, nemaze ewên di siyasetî ew hizban da kar bikin, bo teblîxatî bo

bikin, heta munezemeyekî wa wijûd bê (rewşenbîr divên, ku di van partiyên de kar bikin û di wan de guhertinan çêkin, da rêxistinên rêk û pêk werin holê, û ev bo hemî beşên Kurdistan) Li nuxteyekî Kurdistan tiştêkî wa dirust bibe, xwe li holê feriz bike û ielanî mawcûdiyetek biket, werde werde yê din jî dibin (ger li beşekî Kurdistan rêxistineke niştimanperwera waqîf were holê û bikaribe xwe li holê feriz bike û di xetêke dirust de siyaseta xwe pêşve bibe, hêdî hêdî, yê din jî ê wisa bikin).

Hêviya min heye Kurd rizgar bibe. Esta Kurdî hemî beşekanî Kurdistan derkî yek dikin (pişt hevûdin digrin). Caran Kurdî Îran derkî Kurdî Îraq nedikir, Kurdî Îraq derkî Tirkîya nedikir. A nuha, Kurdî Îran ger biçine Îraq, herwekî ku biçine mala xwe. Eger diçine nik Kurdên Tirkîya, herweha. A ew li yek nêzîkbûna we derkî yekgirtin (pişt hevûdin-girtin) we tefahum, xwe wek milletek hesabkirdin zor zor bo ew tişt (hêviya rizgarbûna Kurd) tasîr heye. Yanê mesele a nuha meseley millî ye di Kurdistan da. Meseleyî Îslam meseley roj niye, meseley komonîstî meseley roj niye. Heqîqet ew e. Wek min li gel bramusilmanekî Îraq li Sulêmanî qise dikir, gotim: kaka, bi xwedê ne Harûn al Reşîd zindû (sax) dibêt, we ne hukûmatî xilafey Îslamî dirust dibê. Xerîfî milletî Kurd bin, herkes bo xoy nimêjî xoy diket. Em ji mîj musulman in, 1300 sal e musulman in. Li ser Îslametî kes me nakujê, kaka, wella li ser komonîstî jî nakujin, li ser Kurdayetî me dikujin, kaka! Haşimî Refsencanî a diçe koy? Diçe Bulxarîstan, diçe Mosko, hema pêşmergekî Kurd digre, edam dike, ji ber ku ew Kurd e, ne ku ew komonîst e, kaka! Îcar bi ditîna min, diyê rexney hêzên siyasî were kirin, ne ku tev wan şer bikin, lê bibêjin, ku xudmuxtari hêç niye, baba! kaka, min çon hemî dunya rizgar dikim; karkerî Îran min çon rizgar dikim? Ew e noh sal e li Kurdistanî Îran şer e, şerêkî zor gewre, heta şerî du dewlet jî kettiwe Kurdistan. Bo çi xelkî Îran pişt şoresî Kurdistan nagirin, bo çi Hizbî Tûde, yan filan, yan filan du hezar karker naşînin Kurdistan muqabilî (li dij) xumeynî şer bikin? Bo çi kesek milyonek tûmen (dravên Iranî) bo Kurdistan naşîne? Eger milyonek karkerî Îran, her yek tûmenek bide, dikarin bidin, de bo çi nadin? Bo çi (rejîmî Îran) pêşmerge li dû dikuje! Ma bo çi Faris, yan Tirk nakuje? Diyar e, Fariseke şoresî Kurdistan bo xoy nizane, kaka, herweha li Îraq jî, herweha li Tirkî jî. De bila hezar karker bê, wellahî tîfing jî bidinê; herkes bo xwe îş diket

Ew Faris û Tirkên diçin cebhe bo xumeynî dikujin, bo çi jî

Kurdan re nakin, ha?! Wek diyar e, wellahî her Kurd e ku şer diket, her Kurd e ewî xebat diket, her Kurd e ewî nan dide, ewî xizmetî pêşmerge diket, her pîrejin û xûşk û dayikî Kurdekeye ku xo perîşan dikin û xo didin ber hezar xeter bo alfîkarî pêşmerge bikin. Kaka, wek milletekî zulm li Kurd dibe û zulmî lê kirawe nehatiye serî kesî. Divêt bo xoy bî, bo xoy!

Tecrîbe nêşanî dawe. Hizbî Komonîstî Îraq, hizbî Tûdey Îran zor nanî milletî Kurd xwardiwe, paşên dijminayetî Kurdan kirdiwe. Kurd madam dixwaze bijî, diyêr wek millet xebat biket, we yan neket.

Bi min xoşe hemû karkerî dunya rizgar bibe we muttehid (hevçirî) be, bi min xoş e seadet(şahî) bo hemû xelqî cîhan bêt, belam ew şîara bo min gewre ye, min natwanim ew şîara hilgirim. Ez dibêm, Kurdistan beşbeş kirawe, milletî Kurd beşbeş kirawe(ji hev veçetandine).

Diyêr milletî Kurd yek bigrêtewe(bi yek be), serzemînekeyek bigrêtew(welatê xwe bi dest xe), milletî Kurd, her bîr û bawerîkî heye(bi hemû bîr û bawerîyan) di sefêkî hevçirî de li eley(dij) dagirker û dijmin xebat biket.

Em Çi Binivîsin Kêm e!

DÎ 7.10.1988 DE KEK DR.N. ZAZA DESTÊN
XWE JÎ VÊ GÊTIYÊ ŞÛŞTÎN Û ÇÛ DÎLOVANIYA XWE-
DÊ!

Gava danûstandina me berî
24 salan destpêkir, em her-
du jî dûrketiyê welêt bûn.
Ew li Lûbnanê û Ew ez li
Ewropa! Em herdu jî evîndar
û dilbirînê welêt bûn û
doza me **serxwebû-**

na Kurdistan bû. Di wê demê de Ew mamoste û ez şagirt bûm. Min bi dilgermî her nameyeka Wî dixwend, di warê zimên û rêzaniyê de pê destkewtî dibûm. Min Ew bi navên "Nuredîn Yusif", "Derketî", "Dîroknivîs", "Çîroknivîs"...ûhd. nasdikir û her nivîsarek Wî dixwend û me li ser wan berhevdanine bê- û havildar dikirin...

Ew li herçar parçe Kurdistan dihate naskirin û armanca Wî jî yekbûna herçar parçan bû. Di destpêka sala 1978 de Wî tevî kek Dr. İsmet Şerîf Vanly li hemû partî û rêxistinên Kurdistanî doza pêkanîna Komcivîna Neteweyî (Kongra Millî) kiribû û me jî karê damezrandina partiya **Yekbûnê** dimeşand. Li ser doza me ku



NURETTİN ZAZA

19.02.19-7.10.1988

Ew û kek İsmet jî werin tê de beşdarbin, Wî di nameya xwe ya 28.02.1978 de welê dinivisî: "Min gotinên te gihandin İsmet ku ji wan kêf-xweş bû.(...)Emê li berxwe bidin ku ev civîn (Kongra Millî,H.R.) çêbibe û tiştêkî hêja jê derkeve. Heke nebû,hîngê em ê binêrin ka em ê çawa bikin ku piraniya Kurdên welatparêz bigehin hev, nemaze yên Kurdistana Tirkîyê..Di rûniştinên xwe de armanca xwe ya bingehîn bikin "bihevgihandina hemî tevgerên Kurdî." Ku em bi rastî dilpak û demokrat bin, bi her awayî,em ê bikaribin bigehin vê armanca ha."...

Ev bû ku me di sala 1979 de, tevî hevalan,partiya **Yekbûn** damezrand û heval "**Çeko**" jî bû berpirsiyarekî wê...

Piştî 10 salan Ew gîha armanca xwe:**Tevgera Rizgariya Kurdistan** di 16.05.1988 de,bi beşdariya 8 partî û rêxistinên Kurdistan,hatibû damezrandin!..

Lê têkoşerê nemir bi nexweşiyeke giran ketibû! Gellekî berxwe diket ku nedikarî di **TEVGERÊ** de destekî pola û bala bileyze...

Em hevalên Wî û em bawer in ku gişt endamên **TEVGERÊ** jî dê nehêlin ku çavên Wî vekirî bimînin û emê li ser têkoşîn û xebata hevbîr bimeşin...

Ciyê Te bihişt be,heval **Çeko**!!

Hemreş Reşo

"Xulasbuna netevê Kurd dan û standin, enî çekirin, hevkarî û yekitiya tevgerên Kurdistanêve girêdayîye". Hemu kesên xwe pirsas Kurdve xerî dike (mijul dike), hemu komele, dezgah, tevger û partiyên Kurd mêjeve ev tişte digotin, dinivîsîn û hej ji dibejin.

Belê eve "rastîyek" zor pewîste. Cihatina vê pewîstîyê gelik diring çebu. Cihanîna "Enîyek Kurdistanî" Kurdistanê Başur zutir çebu û bawer û hêvî dikîn, ku heta rizgarkirina Kurdistanê dom bike.

Kurdistanê Bakur hinik hewildanên (teşebusen) avakirinen hevkarî û enî çekirin karhatin, lê belê mixabin, ku gelik kemasi teda hebun û jîna wan gelik kurtbu.

Piştî berxebatên avakirina "Enîyek Kurdistanî" li Kurdistanê Bakur roja 22.6.1988, li bajarê Brüksel bi navê "TEVGERA RÎZGARÎYA KURDÎSTAN" hate amadekirin. Ev buyîne mizgînîyek gelik mezinbu. Çend kemasi teda hebejî -berku mixabin hemu tevger û partiyên Kurdistanê Bakur li nav "TEVGERDA" cih negirtîne - şabuna dostên Kurdan vê peşve çuna hewceyî çebu û tirsas dijminan zêdetirbu.

Belê, roj ne roja rexnegirtinên xalî û vala, roj ne roja xurabkirin û getkirinêve, roj roja bawerî xweanînê, bawerî hevanînê, dan û standinê, hevkarî û yekitiyêve. Dermanê birinên me ya yêkemûn û giranbiha vê rêve dibore. Em gelik li ser şane, ku partî û tevgerên me vî tiştî hesiyane û nexweşiyên kevnarî li nav xwe havêtîne.

Em ji bo hatina Tevgerê peşveçun, serketin û serfirazî daxwazdikîn û hevîdikîn, ku tevger û partiyên Kurdistanê Bakur, ewên hej derveyî "Tevgerêda" li nav Tevgera cihê xwe bigirin û husa ev Zeximbuna Tevgera Kurdistanê xulasbuna netevê Kurd nezuk bike.

Abidin Sörmez

DAXUYANÎ

Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER) hat damezrandin

Em, heşt hêzên şoresger û welatperwer ên perçê Kurdistanê bin destê Tirkîyê hatin cem hev û me Tevgera Rizgariya Kurdistan (bi navê kurtî TEVGER) damezirand. Armanca me ew e ku em dawî li îşgala biyaniyan a ser welatê xwe ku bi sed salan e dajo, li nîrê biyani yê ser hustuyê milletê xwe û li rejimê kedxuri yê giran û zordariyê binin; li Kurdistanê, dewletek serbixwe û demokratîk damezrinin; civakê ji paşdemayina aborî, civakî û kulturî xelaskin; têxin riya pêşveçûnê.

Di roja îro de, li Kurdistanê ku ji bal çar dewletan hatiye perçekirin; hêzên serdest û kolonyalist, li hember gelê me yê ku tu carî nikarin hesret û evina wî ya ji bo azadiyê bitemirinin, şerêkî qirkirinê dimeşinin; hewl didin ku zimanê me, kultur û tarîxa me jî inkar bikin an bidin jibîrkirin.

Lê belê raya giştî ya cihanî jî dizane ku gelê Kurd wek yek ji gelên kevntirîn ê Asya Nêzîk û Mezopotamya tê naskirin û para wî di avakirina medeniyetên çuyî yên dewlemend ên vî herêmê de heye. Îşgala biyaniyan ya ku ji sed salan ve ye didome, qirkirin, surgûn û zordariyên nedîtî jî bi gelê me neda stuxwarkirin, nikaribû ziman û kultura me jî holê rake. Kurdistanê ku îro di navbera çar dewletan de hatiye perçekirin, xwedî 500.000 kilometir çargoşe erd e, nufûsa gelê Kurd digihîje 25 milyonan. Kurd wek ku hinek dixwazin nişan bidin, ne "eqaliyet", milletêkî mezin e. Gelê me ev du sed sal in ku ji bo azadiya xwe şer dîke û di vî riya de bi sed hezaran însanên xwe kirine bigorî. Îro jî li temamên perçan, bîrxwedana netewî he geştir û berfirehtir e.

Gelê me qerardar e ku nîrê netewî bîşkin. Em jî wek her gelekî bi şeref, dixwazin azad bijin. Li Kurdistanê ku ji alî çavkaniyên sererd û binerd ve yek ji wan çend welatên dewlemend ên dinê ye, em dixwazin paşdemayînê û xizaniyê (belengaziya) jî holê rakin, em dixwazin civakeke gihaştî ya pêşketî deynin ku lêhatiyê (li gor) çerxa me ya îroyin be. Em dixwazin aborî û kultura neteweyî pêşdixin, erdê bidin gundiya xwe, karê bidin kirêkarên xwe. Em dixwazin ku milletê Kurd bikin endamekî ji famîlya miletan a cihanê, yê xwedimafê wekhev û azad. Em dixwazin bi gelên din re di nav aştîyê de, bi hev re û bi dostaniyê bijin.

Di vî demê de ku em xwe nêzî dawîya qirnê 20'an dikin, tu hêz wê nikaribe wê irade û daxwaza gelê me bîşkin. Eşkerekî dixuyê ku politîka wan hêzên kolonyalist û zordar ku heta îro digotin qey di riya rê û dirbên zordarî û fêlbazî re wê karibin gelê Kurd jî holê rakin û ji mesela Kurd xelas bin, îflas kiriyê. Gelek hewlek vala û beyhûde ye ku ew dixwazin çerxa dirokê berevaci bigerin. Ev politîka tu netîce nade, ji bilî ku tevî gelê Kurd eş û elemê bide gelên herêmê yên wek Tirk, Ereb, Fars û Azerî, û ji bilî ku herêmê paşde bixê û rê li ber hederbûna çavkaniyên wê veke.

Em bang li hemû gelên herêmê, mirovên pêşverû, welatperwer û demokratîkî dikin ku li dijî vî politîka zordarî ya çînen serdest ên kevneperest, xurttir rawestin. Ji bo ku milletê qeçera xwe bi serbestî bi destê xwe tayîn bikin, ji bo aştî, tevkarî û pêşveçûnê, hemû gelên herêmê, hemû hêzên pêşverû, divê di nav piştgiriyek xurt de bin, pêk ve, mil bi mil din.

Gelî welatperwerên Kurdistanê! Gelî însanên xîretkêş ên xelasiya welat dixwazin. Li perçê Kurdistanê bin destê Tirkîyê, heta îro, hin gavên ku ji bo yekîtiya hêzên welatparêz hatin avêtin, bi ser neketin yan jî ta dawiyê nemeşyan. Lê belê ev nayê wê manê ku mirov têkeve bê hevîtiyê û xebata jî bo yekîtiyê sist bike. Ji bo biserxistinê û jiyandina yekîtiyê, jî bo xurtkirinê û

gihandina armanca wê divê em serî bi gelek karên zor re derxin. Lê belê çî qas zor dibe bila bibe, em mecbûr in vê yekê bi ser xî û emê bi serxî jî.

Dem a borî ya dûr û dirêj û bi êş a bin nîrê biyanî û tecrubên têkoşîna ku bi sed salan e tê meşandin, baş fêri me kir ku ji bo şikandina hêzên kolonyalist û ji bo rojekê zûtir xelaskirina gelê xwe, bivênêvê(mecbûrî) ye ku di navbera hêzên welatperwer de yekitiyek berfireh û tekûz bê pêkanî. Bir û baweriyên cuda(cawaz) ên li ser vê yan wê meşelê, cudatîyên programî(rêbazî) ne bend in û divê nebin bend ku em di bîr avahiyekekê de bighên hev, bi hev re jî bo armancên mişterek şer bikin, rêxistinên ku Tevger avakirin, jî vê baweriyê bi rê ketin. Sefên wê vekirîye jî hemû rêxistinên re yên ku dixwazin jî bo armancên mişterek ên hêzên welatperwer bi hev re xebat bikin û yên ku çî lazîm be jî bo vê bikin. Em bangî wan rêxistinên jî dikin ên ku ji vi ya jî wi sebebî beşdarî dewra avabûna yekitiyê nebûn ku rojekê zûtir tevî wê bibin, wê xurtîr bikin. Sefên Tevgerê, yeko yeko jî kesên Kurdistanî yên şoreşger û welatperwer re jî vekirîye. Ihtiyaciya têkoşîna me bi alikariya her rêxistin û kesê welatperwer heye.

Em bang li hemû rêxistin û kesên welatperwer dikin ku em bi hev re ciyê xwe tê de bigrin, mil bidin wê. Pêşînhukum(Pêşîngeneel), hissên qayîşkêşîya rêxistinî, xirecira jî kevin de mayî, divê nebin bend li pêşîya yekitiyê.

Werin em bi hev re xebat bikin, jî bo rizgariya Kurdistanê hêzên xwe bighînin hev! Rejîma kolonyalist a Tirk, hîn îro jî di wê politîka xwe ya iflaskirî de îsrar dike; naxwaze hebûn û mafên gelê me nas bike. Lê belê, li hember têkoşîna hêzên welatperwer a ku roj bi roj geş dibe, ew wê hîn bêtir bêçare bimîne. Gelê me her çiqas zêrandîna(êşa) hewqas dijwar dit, hewqas insanên xwe bigorî kir jî disa hustu li zordaran xwar nekir û wê neke. Emê şer bikin û bi ser kevin jî. Dîrok wê bibe şahidê vê yekê! Berpirsyarê êş û elema ku tê kîşandin, ya xwîna ku tê rijandin û wê hîn bê rijandin ne gelê me yê ku dixwaze di aştiyê de bi serbestî bijî, ew hêzên kolonyalist in ku jî bo berjewendîyên xwe yên çavnebarî vê politîka zalîm dimeşîne, berpirsyar wê ew bin.

Gelî mirovên pêşverû û aşîxwaz!

Rêxistinên demokratîk û humanîter!

Divê hûn bédeng nemînin li hember şerê xwîni yê qirkirinê yê ku hêzên kolonyalist û zordar di çaryeka(çarîka) dawî ya qirnê 20'an de, li Kurdistanê ku di nav çend dewletan de hatiye perçekirin bi ordiyên modern ên bi hêz, bi teyare, tank û topan, bi çekên kimyayî dimeşîne li hember miletekî mezinê e ku dixwaze serbixwe bijî.

Tevgera Rizgariya Kurdistan, bang li Rêxistîna Miletên Yekbûyî û sazûmanên pê ve girêdayî dike, bang li welatên demokratîk û aşîxwaz, partiyên demokratîk, rêxistinên ciwan û jinan û hemû kesên xîretkêş ên ku rûmetê didin aştiyê û azdîya kesên din jî, li ronakbîr û hunermendan dike ku pişgiriya gelê Kurd bikin.

22 Heziran 1988

AL	Ala Rizgari
KUK-SE	Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistan- Baskê Sosyalîst
PARHÊZ	Partiya Hêza Welatparêz a Kurdistan
PDK-RN	Partiya Demokratîk Kurdistan-Rêxistîna Netewî
PPKK	Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan
PSKT	Partiya Sosyalîst a Kurdistanî Tirkîyê
ŞK	Şoreşgerên Kurdistan
YSK	Yekitiya Sosyalîst a Kurdistan

(TEVGER)

Tevgera Rizgariya Kurdistan

بزوتنه وهی رزگاری کوردستان

Kürdistan Kurtuluş Hareketi

KURDISTAN LIBE-
RATION MOVEMENT



DIE BEFREIUNG-
BEWEGUNG KURDIS-
TANS

حرکة تحریر کوردستان

جنبش آزادی بخش کوردستان